

amade bike, Dr. Qasimlo hevbîrên xwe jî fêrî guhertinê dikirin. Weke mamostayekê ku hertim şagirtên xwe fêrî tiştên nû dike, Qasimlo hewl dida ku hevbîrên xwe bielimîne kultûrek alternatîv ku rê ji bo guhertinên bingehîn di civakê de xweş bike. Wî şoreş weke pêvajoya avakirina kultûrek alternatîv temaşe dikir.

### Mîmar

Rola Dr. Qasimlo di ji nû ve avakirina PDKÎ de xuya ye. Weke çawan di pêvajoya guhertina qewareya qewmî re ji bo nasnameya nû ya neteweyî, kesayetiyeş pêşeng weke mîmar û endazyarên avakirina qewareya nû rol dilîzin, Qasimlo jî karî hesta qewmî li Rojhilata Kurdisstanê di çarçoveya PDKÎ de nûjen bike, bixe kanalek nû û tevgerêk nû ya neteweyî bîne meydanê. Dîrok her demê kesayetiyan derdixê meydanê ku pêşengiya bizav û tevgerên nû bikin. Kesayetiyeş ku dîrok wan derdixê holê dikarin şopek mezin li ser pêvajoyên siyasî danên. Lê kesayetiyeş ku bi xwe dîrokê çê bikin tak in. Qasimlo yek ji wan kesayetiyan bû ku karî dîrokek nû ava bike û têkoşîna neteweyî li Rojhilatê Kurdistanê bi awayek modern bivejîne û bixe ser hêla siyaseta hemdem.

### Evîndarê jiyane

Kêm kes weke Qasimlo hezkiriyê xweşiyên jiyane bûn. Di gel ku wî hemû xweşiyên jiyana xwe kiribûn goriyê armanca siyasî, û jiyana xwe bi yekcarî xistibû xizmeta neteweya xwe, lê wî tu car xemlên jiyane ji bîr nekirin. Ji pak û xawênîya tak û jîngehê re bigre heya xurtkirina kultûra jiyaneheziyê. Kesên ku Qasimlo ji nêz ve nas dikim an bi wî re kar dikirin hertim ken, dilxweşî, jiyanehezî u pîtedan bi hemû war û rengên jiyane li cem wî didîtin. Her gulek bêhnek û her rengêk xemlek bû ku tu gav ji ber çavên Qasimlo wenda nedibûn. Lewma jiyana şorişgerî û têkoşîna siyasî ji wî re rêgir nebûn ku di gel karê siyasî, bi kultûr, edebiyat, şeîr û dab û edetên civak û gelê xwe re jî mijûl bibe.

### Rênîşander

Pîvanên ku Dr. Qasimlo di siyaseta PDKÎ de bi cîh kirin, îro, 21 sal piştî şehîdbûna wî, weke

çavsa x û rênîşanderê rêçika siyasî li Rojhilatê di rojeva gel de ne. Qasimlo ji kultûra nefretê bi dûr bû. Lewma her derfetek ku biketa dest, bi kar dianî heya deriyekê di riya siyasî de veke. Her çend ew hewldan bû hegerê şehîdbûna wî, lê wî pîvana "di siyaseta de dostê heya dawî an dijminê heya dawî nîne" bi cîh kir. Qasimlo her weha hewl dida ku di navbera dijberiyên de û di rewşên aloz de heya li destan tê parseng an balansê biparêze.

Di gel ku wî hewl dida ku kurdên her beşek Kurdistanê bi doza xwe li çarçoveya welatê ku lê dijîn re mijûl bin, lê Qasimlo tu gav xebata hevbeşe neteweyî ji bîr nekir. Ew weke şêvirmendekê hertim bi tevgerên Kurd li beşên din yê Kurdistanê re di têkiliyan de bû û her gav ku pêwîst didît bi şeîr û şîretên xwe doza neteweyî di beşên dine Kurdistanê de bi pêş dixist. Qasimlo di heman demê de hertim bi rewşên bîr û pêşengên Kurd li beşên dine Kurdistanê re di têkiliyan de bû û ji bo avakirina kultûra hevbeş ya neteweyî rê nîşanî wan dida. Mînakê herî diyar ji karê Dr. Qasimlo bo piştgirîkirin ji karê hevbeşe neteweyî re alîkariya wî ji bo avakirina Enistîtûya Kurd li Parîsê di sala 1983 de bû ku bi hîmdariya serokê niha yê Inistîtûyê Kendal Nezan, Qanatê Kurdo, Cigerxwîn, Mam Celal û hwd ava bû.

### Gelaledarêj

Dr. Qasimlo kesayetiyeş dîrbîn bû ku hem ji bo dema tede dijiya û hem ji pêşerojê re xwediyê pîlanên demkurt û demdirêj yê siyasî bû. Eger hin ji pîlanên Dr. Qasimlo di piratîkê de pêk nehatibin jî, lê wî tu gav bê pîlan dest bi karekî nedikir. Lewma di dema jiyana Dr. Qasimlo de mijara sereke di nav rêxistinên PDKÎ de her tim pîlanên kar ji bo pêşxistina tevgerê bû.

### Efsane

Qasimlo jiyana xwe kire goriyê azadiya gelê xwe, lê piştî şehîdbûnê bû ustûreyek neteweyî ku ji bo pêşeroja gelê xwe rastî û efsaneyê bi hev re girê dan û ji bo nivşên pêşerojê bû efsaneyek ku hertim wê di hizr û xeyala keç û xortên welat de zindî bimîne. bimîne.